## Di salvegera avakirina Komara Kurdistanê de

»»»» R:10




## Cêjna evîndarên azadiyê

»»»» R:4


*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (438) 20-01-2023Buha (1000) Tûmen*


## Şoreşa Jîna yê heya serkevtina yekcarî berdewam be

»»»» R:6

## Bas ji yekîtiya opozisyon û çend xalan

»»»» R:8



# Navenda Birêveberiya PDKÎ bi hilkefta ٢ê Rêbendanê daxuyaniyek belav kir

**Navenda Birêveberiya Giştî ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 2ê Rêbendanê, 77emîn salvegera avakirina Komara Kurdistanê daxuyaniyek belav kir.**

**Deqa daxuyaniyê wiha ye:**

**Rewşa îroyî ya Îranê û erkên me**

**Xelkê qehriman ên Kurdistanê!**

**Gelên azadîxwaz ên Îranê!**

**Hizb, rêkxiraw û kesayetiyên xebatkar!**

2ê Rêbendana 1401an a Rojî (22ê Kanûna Paşîn a 2023an), 77 sal bi ser avakirina Komara Kurdistanê bi serokayetiya Pêşewa Qazî Mihemed re derbas bû. Em bi vê hikeftê bi germî pîrozbahiyê li hilgir û şopînerên armancên vê Komara Kurdistanê û hemû têkoşer û bawermendên azadkirina pêkhateyên etnîkî, nijadî, zimanî û oliyên Îranê ji bindestî û cudatîdanînan dikin.

Yadkirina damezrandina Komara Kurdistanê ji bo Hizba Demokrat û netewa me bi giştî giringiyeke taybet heye. Em bi bîranîna Komara Kurdistanê, emegnasiya xwe bi armancên vê Komarê re dûbare dikin û rêz li pêşengbûna tevgera neteweyî û demokratîk a gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê li ragihandina hikûmeteke Kurdî digirin; Em aliyên bihêz û bedew ên siyaset û kiryarên vê desthilata Kurdî li ser asta navxweyî, li pêwendî digel gelên Îranê û hêzên têkoşer ên welat li dijî zordariya rejîma Pehlewî û herwiha li beşên din ên Kurdistanê bi bîr tînin.

Komara Kurdistanê yekemîn ezmûna modern a zalbûna Kurd li Îranê bi ser çarenivîsa xwe di beşeke nîştimana xwe de bû. Komara Kurdistanê karî ji rûyê dahênana sembolên serweriya neteweyî, berfirehkirina hest û bîra niştimanperwerî û yekrêziya Kurdistanê, xizmet bi zimanê Kurdî û rêzgirtin ji kêmîneyên olî û neteweyan, hevxebatî û hevpeymanî digel gelê Azerbaycanê û hêzên pêşkevtî yên Îranê û di gelek warê din de çavkaniya xizmetên mezin û mînakek bilind be. Ev waneyane ezmûna desthilatdariya Komara Kurdistanê, piştî rûxandina vê Komarê jî, wek rênîşander û rênimîniya tevgera neteweyî û azadîxwaziya Kurd li Îranê û li seranserê Kurdistanê mene.

Îsal em di rewşek taybet de ku seranserê Îranê girtiye, yad û bîra Komara Kurdistanê dikin. Îran di dawiya Havîna derbasbûyî de û piştî şehîdkirina Jîna Emînî ji aliyê Polîsê bi nav Exlaqî ve li bajarê Tehranê, bû bi qada teqîna bêzarî û kerb û kîna xelkê welat li hember tevahiya rejîma Komara Îslamî ya Îranê. Ew tawana Jîna serhildanek şoreşgêrane li pey xwe anî ku çar meh e li seranserê Îranê di gorê de ye.

Serhildana han li şûna armanckirina dezgehên desthilatdar û daxwazên sînordar, tevahiya rejîmê û xwedê rêberê wê rejîmê wek mak û çavkaniya tepeseriya li Îranê kiriye armanc û daxwaza hilweşandina dîktatoriyê dike. Jin û keç, xwendekar, dersxwan, netewên bindest ên Îranê, karker, mamostayan, hunermend û werzişvan û tex û qatên herî hejar û bêparên welat, bi destê vala lê bi îradeyeke bêhempa ve hatine meydanê.

Rejîma tarîperest û teror û tawankar hemû hêzên xwe yên tepeserker ji bo bêdengkirin û têkbirina wan kom kiriye û destên xwe ji bo her cure cinayeteke vekiriye, bi awayekî ku zêdetir ji 500 xwenîşander şehîd bûne, bi hezaran birîndar bûne û nêzîkî 18 hezar kes ji wan hatine girtin û di bin lêkolîn û îşkenceyan de ne û hejmarek bi îdamê û bi dehan jî, bi sedema îşkenceyê canê wan ji wan hatiye standin. Lê xelkê serhildêr dev jê bernedane û hê jî bi şêwazên cuda li qadan in û li ser daxwaza xwe ya rewa rijd in.



Di wê heyamê de, Xamineyî û gelek fermanderên Spaha Pasdaran a terorîst, car û car derheq wê serhildana bêmînak lêdwan didan. Wan wek hertimî, hatina ser şeqaman a xelkê Îranê bi destêwerdana bi gotina wan welatên dujmin û aliyên cudaxwaz ve girêdaye. Wan ragihandiye jî ku wan dawî bi serhildanê aniye. Desthilatdarên rejîmê bi jiberçavgirtina rola pêşengane ya xelkê Kurdistanê di wê serhildanê de û bi zanîna hezkirin û bandora Hizba Demokrat û rêxistinên din ên siyasî li ser xelkê, bi mûşek û dronan êrîşî bargeh û kampên van hizban li kûrahiya axa Herêma Kurdistanê de kirin. Ew destdirêjiye û tawanafirandina wan jî, mil bi milê givaşxistin li ser hikûmeta Îraqê û hikûmeta Herêma Kurdistanê, heta niha çendîn caran dûbare kiriye û li ser gefên xwe di wî warî de berdewam e.

Hziba Demokrat a Kurdistana Îranê di 77emîn salvegera avakirina Komara Kurdistanê de bi hewce dizane ku bi kurtî dîtingeha xwe li ser serhildana şoreşgerî ya niha û erkên îroyîn û girîngên tex û qatên xelkê û hêzên siyasî yên Îranê vebîr bîne:

Serhildana wê carê ku bi silogana "Jin, Jiyan, Azadî" tê naskirin û jin di rêza herî pêş de ne, berhema çil û sê sal hovîtî û nekarayiya Komara Îslamî û ezmûnvergirtina xelkê Îranê û bijardeyên neyarên wê rejîmê ne. Ev serhildane daxwaza rûxandina rejîmê dike, ne çaksaziyê di çarçêveya wê de; Tevahiya Îranê li xwe girtiye, ne herêmeke taybet li xwe bigire. Bi berawird digel serhildanên girseyî yên berê, ew serhildane herî berfireh û demdirêj a xelkê ye û herî zêde tex û qat bi yekgirtî ve tê de beşdar in.

Navçe, bajar û parêzgehên netewên bindest bi taybetî Kurdistan û Belûçistan ku li pêşiya xwenîşandanan de bûne û para herî mezin a qurbanîdanê dîtine. Eva ku di vê heyamê de li serkuta xelkê li Kurdistan û Belûçistanê me dît, şerê hovane yê hêzên çekdar ên hikûmetê ye ku bi çekan li dijî xelkê bêberevan in, lê xelk bi moral û bawereke polayî ve berxwedanê dikin. Xelkê beşên din ên Îranê ne tenê bi îdeayên rejîmê yên derheq cudaxwaziya van neteweyan nehatine xapandin, belkî bi emegnasî û berxwedanî ve, ev yeka mêze kirine û hevgirtin û piştevaniya xwe nîşan dane. Li ser hev, ne tenê hewldanên rejîmê yên ji bo parçekirina civakên gelên Îranê hatine pûçkirin, belkî yekitî û yekrêziyek bêmînak di civaka Îranê de li dijî Komara Îslamî pêk hate.

Serhildana netirsane ya xelkê li navxweyê welat, yekgirtî û hevsoziyek bêmînak di navbera milyonan Îraniyên derveyê welat de jî çê kiriye û bûye bi çavkaniya çalakiyên siyasî yên cur bi cur.

Di encamê de korr û komelên siyasî û mirovdostane yên navdewletî, zêdetirîn hevsozî û hevpeywendî digel xelkê serhildayî li navxweyê Îranê kirine. Devberdana welatên Rojavayî ji civînên taybet bi rêkkevtina Bercamê, tehrîmkirina hejmarek zêde ji karbidest û demûdezgehên

»»»Dom R:3

»»»Doma R:2

serkutkarane yên rejîmê ji aliyê welatên Rojavayî ve, derxistina wê rejîmê ji Komîsiyona Jinên Netewên Yekgirtî û biryara pêkanîna Komîteya Peydakirina Rastiyan derheq tawanên Komara Îslamî, beşek in ji destkevtên piştevaniya cîhaniyan ji xelkê serhildayî yên Îranê.

Serhildana şoreşgerî ya gelên Îranê di demekê de ber bi pêncemîn meha xwe ve diçe ku ne li navxweyê welat û ne jî li derveyê welat, hêviyeke zelal ji çarenivîsa Komara Îslamî re nemaye. Tevliheviya rejîmê bi Rûsiya êrîşkar re û hevkariya wê li şerê Ukraynayê bi Rûsiyayê re, berdewam û berfirehkirina hewlên wê yên terorîstî li navçeyê, Ewropa û Amerîkayê, hewlên wê yên şikdar ji bo pêşxistina çekên navkî, hemû ev yekane bi hev re digel karnameya wê ya reş a çend meh ji afirandina cinayetan li hember xelkê serhildêr hevdem bûn. Pirsa nasandina Spaha Pasdaran ji tevahiya xwe ve wek saziyek terorîstî, pirseke micid û îroyî ye ji aliyê Yekîtiya Ewropayê ve ku her cure biryarek li ser bê dan, lêkevtên wê bi ziyana wê rejîmê bi dawî dibin.

Li navxweyê welat jî, tevî hemû dirindehiya hêz û dezgehên serkutkar ên rejîmê û îdeayên wê derheq li dawîhatina serhildana xelkê, roj nîne ku dehan mînak ji kombûn, çalakî û siloganên dijî dîktatorî, nemaze di rêûresmên yadkirina şehîdên wê serhildanê, xwe nîşan nedin. Li gor îtirafên eşkere û nehênî yên serkirdeyên rejîmê, tişta ku zêdetir tê hîskirin, westandin, paremayî û hilverîn di nava hêzên rejîmê de û bi tenêmana Xamineyî û destûpêwendiyên wî û heta di nava mohrên payebilind ên xeleka rejîmê de diyar e. Tişta ku tê dîtin têkçûna şermane ya pîlanên wan yên rawestandin, xapandin û perdepoşkirina serhildana şoreşgeriya xelkê ye. Ev faktor ji aliyekê ve û zêdebûna kesayetên akademî, hunerî û werzîşî di nav refên xelkê de aliyek dinê ye ku îsbatkirina vê rastiyê ye ku ev serhildane heta ku dawiyê bi dîktatoriya Axûndî neyêne, nayê rawestandin.

Nehsitiyek din a Komara Îslamî di vê rewşê de, îflasa zêdetir a aborî, daketina bêmînak a nirxa diravan û paremayîn li dana mûçeyê mehane yê mamosteyan û kirêkaran; paremayîn ji dabînkirina destpêktirîn hewcehiyên rojane yên xelkê û bi taybet nan û şewat û derman e. Bûdceya sala 1402 a dewleta Reîsî, kêmtirîn girtîngî bi arîşeyên bingehîn ên xelkê hatiye dan û zêdetirîn bo Spaha Pasdaran a terorîst, Wezareta Îtilaat, Deng û Rengê rejîmê, hêzên leşkerî, besîc û saziyên girtîgehê re hatiye terxankirin. Ev yek jî vê rastiyê piştrast dike ku Komara Îslamî xwe li ber lehiya rûxandinê dibîne û ji bilî hêz û saziyên ku pêwîstiya wan bi tepeserkirina xelkê heye, ti tiştek din bo wan girîng nîne.

Em wek Partiya Demokrat a Kurdistan Îranê, xwe bi beşeke çalak ji wê serhildana şoreşgêrane ya Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî dizanin. Xelkê Kurdistan bi rênimîniya aliyên siyasî yên xwe, rêkxerê tevgera netewî û şoreşvanî ya Kurdistanê her ji destpêka hatina serkar a Komara Îslamî ve, ew rejîme bi sedema navroka kevneperestî û dijemirovî ve red kirine û 43 sal e di hember siyasetên wê de sekinandine. Di wê serhildana niha de jî, Kurdistan ji rêza here pêş ve û hêvîbexşîna tev Îranê ye. Em li asta şehîdên wê serhildanê li Kurdistanê û seranserê Îranê serê rêz ditewînin. Em şanaziyê bi morala bilind, helwest û peyama şoreşgêrane ya malbatê wan û hevderdî û piştevaniya xelkê digel malbata şehîdan, birîndaran û binçavkiriyan dikin. Me rêzek taybet û pêzanîn heye bo mamosteyên olî yên Kurdistanê ku di wê heyamê de ti sehek wan bo sozên direw û gefên karbidestên rejîmê nebû û wek hertimî digel xelkê xwe bûn.

Daxwaza me ji xelkê Kurdistanê û seranserê Îranê eve ye ku vê yekrêzî û hevgirtinê ku tirsa herî mezin di nava wê rejîmê de çêkiriye û ew hêza gendeliyê ji holê radike, biparêzin û bihêztir bikin. Di vê derheqê de bi eşkere rûyê axavtina me ji wan netewên din ên Îranê, rûniştiyên bajarên mezin ên welat û wan tex û qatên ne ku heta niha tevlî serhildanê nebûne û em daxwazê ji wan dikin ku dest bi kar bin û werine ser şeqaman. Armanca sereke ya wê serhildana şoreşgêrane dawîpêanîn bi temenê pir ji tawana Komara Îslamî ye.

Afirandina paşerojekê ye ku tê de hemû civakên Îranî dawiya zordarî û cudakariyê bi çavê xwe bibînin û hest bi rêz, rûmet û mafên xwe bikin. Ev armancane tenê bi tevlîbûna giştî û girseyî di vê serhildanê de digihe bi armanca bi dil. Bi rêkxistina grevên karkeran li seranserê welat, têkbirina çavkaniyên dahata rejîmê, birina xwenîşandanên ser şeqaman û kolanan ber bi Tehran û bajarên mezin ve, û dûrxistina kesên ku xizmeta saziyên rejîmê bi taybetî hêzên tepeserker dikin, ew serhildane bi serkevtina yekcarî digihe. Yek ji erkên herî girîng ên niha, çêkirina yekitî û hevpeymanetiya seranseriya hêz, rêxistin û kesayetên opozîsiyon e.

Hevgirtinek ku li ser bingeha armancên hevbeş be û pêkanîna şêwra an navendek ji bo piştgirî û alîkariya serhildana xelkê navxweyê Îranê û amadekirina zemîneyek bo qonaxa veguhastinê. Bûyereke bi vî rengî dê roleke mezin bilîze li avakirina hevrêziya di navbera xelkê serhildêr ên navxwe de û geşbînî û misogeriyê wan ji bo alternatîvên pêşerojê çê bike. Herwiha derheq rakêşana zêdetirîn piştevaniya cîhanî bo wê serhildanê û standina kursiya nûneratiya rejîma Îranê di navendên navdewletî de bandorek mezin dibe. Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di demekê de li ser wê hewcehiyê tekeziyê dike û pêşwaziyê ji peymaneke hevbeş û hevbendiyeke seranserî dike, ku amadeyê îtiraf Ii cur bi curiya etnîkî û qebûlkirina mafên wan yê netewayetî û hewildan bo cih û pêgeha şiyaw bo nûneratiya siyasiya xelkê Kurdistanê hebe.

Yad û bîra 2ê Rêbendanê û damezrandina Komara Kurdistanê, di rewşa niha ya serhildana gelên Îranê de, baştirîn rênimîniya xebata me ye.

Komara Kurdistanê ne tenê ji bo bidestxistina armancên netewî yên gelê Kurd hatiye damezrandin, belkî hevdem hereketeke demokratîkxwazane jî li dijî dîktatoriya şahenşahî û ji bo cîbicîkirina komek nirxên mirovî û şaristanî hatiye damezrandin. Xebata me ya îro û niha hevdem ji bo bidestxistina mafên neteweyetiya gelê me û dirustkirina çarçoveyek ji hevpeywendî û pêkvejiyan di Îranê de ye. Çarçoveyek li ser bingeha demokrasî û pejirandina zêde neteweyî û hemû rengî di wî welatî de be.

Komara Kurdistanê di eynî cîbicîkirina xewnên serwerîxwazeneya Kurd de, amdehiya danûstandina binyatnerî digel ekterên din ên meydana siyasetê jî di Îranê de hebû. Îro jî Partiya Demokrat a Kurdistan Îranê, tevê vê ku xebta bo daxwaza netewayetiya gelê me û bihztirkirina aliyê Kurd bi girîng dizane, li vir heta li ser asta Îranê jî, hevkarî bi bidestxistina paşerojeke demokratîk bike ku tev pêkhateyên vî welatî, nemaze netewên bindest xwe tê de bibînin.

**Silav li yad û bîra 2ê Rêbendan û armancên Komara Kurdistanê**

**Silav li şehîdên rêya azadiyê li Kurdistan û Îranê**

**Serkevtin ji bo serhildana yekgirtiya gelên Îranê bo dawîpêanîna Komara Îslamî**

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

**Navenda Birêveberî**

**30`ê Befranbara 1401`ana Rojî**

**20`ê Kanûna Paşîna2023`an**

# Cêjna evîndarên azadiyê



N:Nûredîn Sofîzade

2 yê Rêbendanê di dîroka gelê Kurd de, rûpelekî zêrîne ku netewa Kurd şanaziyê pêve dike, û hemî Kurdekî welatparêz û rizgarîxwaz bi a xwe dizane.

Di roja 2 yê Rêbendana 1324an a Rojî, di hemberî 22 yê Kanûna Paşîn a 1946an a Zayînî, bi berçavgirtina rewş û derfeta hatî pêş, jialiyê Hizba Demokrat a Kurdistnê ku 5 meh bû ev Hizb hatibû avakirin, li Rojhilatê Kurdistanê de, Komara Kurdistanê hate ragihandin û xweziya dîrokiye Kurdan hasil bû.

Navend û paytextê vê hikûmeta moderne Kurdan bajarê Mehabad ê li Rojhilatê Kurdistanê bû û Pêşewa Qazî Mihemet ku rêberê Hizba Demokrat jî bû, bû serkomarê Komara demokratîke Kurdistanê.

Di vê nivîsînê de ez naxwazim biçme ser hûrgiliyên dîrok û derfet û çavaniya damezrîna Komara Kurdistanê, belkî dixwazim amajê bi hinek xal û mijarên girîng bikim ku ev Komara çavan a hemî Kurdan bû, û çima heya nihajî gelê me xweziya çêkirina ji nûve ye komarekî hevşêweya Komara Kurdistanê ye û heya niha jî xebat ji bo wê yekê tête kirin.


Hemî aliyek dizane ku xêncî destkevtên netewî û rizgariyê û avakirina Komarekî demokratîk û pêkanîna statoyekî bi navê dewlet û deshilata Kurdî ku hebxwe qedera xwe bidestve girtin, Komara Kurdistanê xwediyê hinek taybetmendiyên girîng bû ku lewmaye heya niha jî gelê me xebatê dike bo bidestveanîna wan destkevt û mafane ku mînaka herî başe wê Komara Kurdistanê bû. Ev xalên girîng çine?

1 – Di jêr deshilata Komarê de bû mafê Civakî, Çandî, Siyasî, Baver, Olî, Qatî, Regezî bi avayekî herî demokratîk bo hemî hevwelatiyên nawçên jêr deshilata Komarê de hatibûne berçavgirtin û dabînkirin.

2 – Di Komara Kurdistanê de û bi hegera wan maf û azadiyên demokratîk bû ku hem astê hişyariya xelkê çobû serê, hem heta nîştmanperwerî û netewî zêde bû û geşe kir, bi avayekê ku hemî kesê xwe xwediyê Komarê û destkevtên vê dizanî û amade bû li pêxema parêzgarî ji nîştman û komarê, canê xwe jî gorî bike.

3 – Heya îro rojê jî bo gelê me û hemî dost û dujminan re eyan bûye ku rolê bi rêkxistin kirin û birêve birin û damezrandin a Komarê ji aliyê Hizba Demokrat ve bû, lewra em dibînin ku di demekê de hinek kes û alî cehdê dikin ji bona kêmreng kirina rolê pêşengayetiya rêkxistin û Hizban, lê di dîroka dûr û dirêje piştî jinavçuna Komarê heya niha, gelê me, carekê bo hemî caran ev êke dane kivşê ku hekî hiviyek hene ku di pêşerojê de destkevtekî hevşêweya komarê hebin, bê guma divê dîsan her ev erkê avakirin û birêvebirin û parastinê li ser milê Hizba demokrat û sîstema hizbayetiyê be.

4 – Serederî û teamola Komarê di gel pirs û kêşeya pêkvejiyana hemî cudahiyan û bi taybetî di gel netewên xeyrî Kurde cîranê Kurdan û Axa Kurdistanê, hevkarî û hevahengî û hevpeymaniya Kurd û Turkên Azerî û Komara Kurdistanê û Hikûmeta Demokratîke Azerbaycanê, di serdemê Komarê de, baştirîn mînak û çareseriye ku hertim dikare bo me ders û mînak û ezmûnek be bo jê fêrbûnê




ku em bikarin di pêşerojê de bikar bînin.

Ger li wê demê ve heya niha xebat û berxwedan bi taybetî ji aliyê Hizba damezrênerê Komarê ve bê rawestiyan berdewam bûye û ev Hizbe “PDKÎ” xwe warisê Komarê û wan xalên serve hatinî baskirin dizane, di resaleta xebata xwe de heya niha jî xwe berpirsyar dizane li hember wan destkevtane de û sozdare ger li pêşerojê de Kurd û Kurdistan bigîje mafê netewiye xwe, hemî ev xalên hatinî baskirin wek şanaziya di deshilata Komarê de bêne cîbicîkirin û parastin, Hizba Demokrat jêveye bi derbasbûna zeman, netenê ev rêkar û mijarane evn nebûne, belkî rêkar û xalên herî girîngin ku niha jî dikare bi avayekî herî pêşkevtî û modern û demokratîk bo birêveberiya statoya Kurdistana azad bêne bikaranîn.

Şoreşa niha a Kurdistan û Îranê “Şorişa Jîna” yê bi dijî dîktatoriya Îslamiya Îranê, hekî bo xelkê dinêye seranserî îranê tenê bo ji navbirina dîktatoriyê û bi destve anîna azadiyên siyasî û civakî û yên dinê be, bo gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê hinek armancên dinê jî hene ku li ser hemen resaleta mîrasên Komara kurdistan ye ku bi nemana Dîktatoriyê Îran dûrbe ji Îdolojîkekî taybet, li destê neteweyekê û ziman û çandekê de, belkî Îran a hemî xelk û netewên cuda cudaye Îranê be, û Kurd jî bikarin li Rojhilatê Kurdistanê de qedera xwe bigirne dest xwe û wan maf û azadî û destkecvtên hevşêweya Komara Kurdistanê bidestve bînin.

Xwedîkirin û geşandin û vejandina vê hesta netewî, welatparêzî, êkitiya netewî û êk gotariya siyasî bo bidestve anîna wan destkevtan jî li Kurdistanê de, mirov dikare bibêje ku ji a heçî nawçe û neteweyekî dinê ye Îranê zêdetir û piştir be.

Hemî ev xalanene ku bûne cihê şanaziya Kurdan ku îro rojê hemî xelkê Îranê Kurdan û Rojhilatê Kurdistanê û Hizbên vê û bi taybetî PDKÎ wekî xwedî ezimûn û cihê lêfêrbûna xwe dizanin û bio pêşengê vê şoreşê û olgu û cihê hivya xwe dizanin, eva jî şanaziya herî mezine.

Bingeha vê şanaziya Kurdan û PDKÎ jî vedigere bo ezmûn û destkevtên damezrandina Komara Demokratîke Kurdistanê û gelê Kurd jî baş dizane ku wê hizbê hemî qonaxên dijvare xebatê bihorandine bona careke dinê ji nûve bidestxistina destkevtên hevşêweya Komara Kurdistanê û li wê rêkê de jî gelek nirxên giran dane û rêberên mezine xwe her ji Pêşewa Qazî Mihemedî serkomar ve bigre heya digîje Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û hezaran Kadr û Pêşmergên Kurdistanê, eva jî bûye sedemekî baş bo evê ku gelê me wê Hizbê bi pêşengê xwe bizane û xwe jê cuda nezane û xwe erkdar bizane ku tewawkerê wê xebatê bin, lewmaye ku em dibînin îro rojê xort û keç û kurên Rojhilatê Kurdistanê çawan li ser şeqaman sîngê xwe didne ber çekên rejîm, hemî ji bona bidestve anîna wan daxwaz û armancane.

Cêjna Îsal a 2 yê Rêbendanê salvegera damezrandina Komara Kurdistanê, cêjna şehîdên wê şoreşê ye, Pîroz be ji malbatên serbilinde şehîdan û bi hivya bidestve hatina armancên Komarê.

# Sabîr Ebdulahîzad: “Darvekirin wekî sizayê ku mirov li mafê jîyanê bêpar dike



Sabîr Ebdulahîzad

**Me digel Sabîr Ebdulazade pisporê maf li derheq bidarvekirina girtiyan ji aliyê rejîma Îranê ve hevpeyvîn pêk anî û navbirî got: “Darvekirin wekî sizayê ku mirov li mafê jîyanê bêpar dike, hertim yek ji wan amûran bûye ku hikûmeta Komara Îslamî ya Îranê li dijî dijberên xwe û nemaze li dijî Kurdan bikar anîye.”**

**P: îdamkirinên Bikom ku di girtîgehên Îranê de diqewmin nîşana çi ne?**

**B:** Darvekirin wekî sizayê ku mirov li mafê jîyanê bêpar dike, hertim yek ji wan amûran bûye ku hikûmeta Komara Îslamî ya Îranê li dijî dijberên xwe û nemaze li dijî Kurdan bikar anîye. Armanca rejîmê ev e ku bikaribe tirsê bixe dilê kurdan û hewl û têkoşîna wan ji bo bidestveanîna mafên xwe yên rewa asteng bike.

Di roja îro da ev amûr hîn bi awayekî xurttir tê bikaranîn û em dibînin ku çend rojan carekê çend lawên têkoşer tên darvekirin. Bêguman zêdebûna vê dîyardeyê nîşaneya tirsa rejîmê ye ji şoreşa nû ya Kurdistan û Îranê ku wekî Şoreşa Jînayê tê naskirin. Rejîma Îranê îro rojê di rewşa herî lawaz da ye.

Tirsa hilweşîna pergalê ketîye nav hemû rayedarên vê rejîmê, lê dîsa jî hîn tundajoyên rejîmê di vê bawerîyê da ne ku dikarin bi mijagirtin ji tundî, îşkence, kuştin, darvekirin û sizayê zîndana giran şoreşa heyî tepeser bikin.

**P: Bi nerîna we Komara Îslamiya Îranê bi îdamkirinên bilez û bêserşûnkirina girtiyan dikare pêşî ji xwenîşandanan bigire?**

**B:** Her vekî ku min amaje pê kirî, Komara Îslamî îro di rewşa xwe ya herî lawaz da ye. Ji alîyekê givaşên navxweyî û navneteweyî gihiştine astekê ku nikare mifayê ji çavkanîyên berdest yên rewabûna sîyasî û hiqûqî bigire. Ji alîyekî din ve jî hîmê şoreşa li Kurdistanê û bi beşdarîyeke çalak û bêwêne ya jinê hatîye danîn.

Bi boçûna min sizayên nedadmend ên bi vî rengî ku di gewhera xwe da li dijî hemû rêzik û rêgezên hiqûqî ne, tu caran nikarin gelên Îranê û nemaze gelê kurd ji serhildanê dilsar û bêhêvî bikin.

Jixwe dîrok jî vê rastîyê diselmîne ku tu rejîmeke dictator nekarîye bi rêya mifagirtin ji şidetê berdewamîyên bi desthilatdarîya xwe bide.

Lê divê mirov hin rastîyan jî berçav bigire. Tevî ku Kurdistan û Beloçistan bi awayekî berdewam û birêxistîbûyî hêzê didin peykerê şoreşê, gelên din û bi gotineke din herêmên ku fars, azerî û hwd lê niştecih in, heger ku bêdeng jî nebin, xwepêşandanên xurt pêk naînin.

Ev jî hem lêçûna şoreşê zêdetir dike, hem jî bare berpirsîyarîya kurd û beloçan girantir dike. Nexwe li gorî boçûna min şoreşa heyî xwedî hemû pîvanên serkeftinê ye û bi van kiryarên hovane nayê vemirandin.

**P: Gelo Saziya Lêborîna Navnetewî û saziyên mafên mirovî dikarin pêşî îdamkirina bikoma hevwelatan ji Komara Îslamî bigire, û herwisa ev bandora wan saziyan li ser pêşîgirtin ji îdamkirina heye?**

**B:** Em di serdemekê da dijîn ku pergala Neteweyên Yekbûyî li cîhanê hakim e.



Serwerîya sîyasî hêmana bingehîn a vê pergalê ye.

Li kêlek serwerîya sîyasî, di vê pergalê da hertim tekezî li ser parastina aştî û ewlehîya navneteweyî tê kirin ku armanca vê rêgeza sîyasî-hiqûqî jî dabînkirina rêgeza yekparebûna axê ya endamên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ye. Bi vê pêşgotinê dixwazim bibêjim ku hemû rêzikên hiqûqa navneteweyî li ser bingeha parastina dewletê hatine dariştin.

Dewlet e ku wekî mijara sereke ya hiqûqa navneteweyî tê dîtin. Sazî û rêxistinên navneteweyî yên ku di bin seywana Neteweyên Yekbûyî da dixebitin û herwiha sazî û rêxistinên serbixwe yên ku têkoşîna parastina mafên mirovan dikin, tu caran ji vê çarçoveya hiqûqî dernakevin ku di rêziknameya Neteweyên Yekbûyî da amaje bi wan hatîye kirin. Ji alîyekî din ve, hêza hiqûqî ya wan sazîyan ewqas nîne ku bikaribin dewletekî mîna Îranê bi awayekî berbiçav tengav bikin.

Wekî delîlê vê angaştê mirov dikare xwe bispêre pêngava vê dawîyê a Konseya Mafên Mirovan. Vê konseyê biryar da ku komîteyekê ji bo lêgerîna heqîqetêê têkildarî bûyerên çend mehên dawî yên ku li îranê qewimîbûn ava bike. Armanca komîteyê ev e ku li ser binpêkirina mafên mirovan lêkolîn bike. Lê em dibînin ku rejîmê heya roja îro jî guh nedaye civaka navneteweyî û asta binpêkarîyên mafên mirovan hîn ji berê jî zêdetir bûye.

Tenê xala erênî ya hêjayî amajeyê derbarê pêngavên wan sazî û rêxistinan da ev e ku bala raya giştî ya cîhanê dikêşin ser binpêkarîyên ku li Îranê rû didin û dibin çavkanîyek ji bo xurtkitina givaşên sîyasî û dîplomatîk li ser rejîma xwînxrar ya hakim.

**P: Gelo di heyama hefteyên derbasbûyî de me dît ku parlementerên parlementoya Ewropayê kefaleta girtiyên xwenîşandanên seranserî yên Kurdistan û Îranê digirtin bistûyê xwe, lê, Komara Îslamî ti hesabek bo wan nekir û girtiyan îdam dike, ev kiryara çi encamek li pey heye bo rejîma Îranê?**

**B:**“Kefaleta sîyasî” an jî bi gotineke din “destekdêrîya sîyasî” di wêjeya hiqûqî da dîyardeyeke nû ye. Ev têgih cara pêşîn sala 2003yan ji hêla parlamentoya Almanîyayê ve ket rojevê. Îro nûnerên parlamentoyên hin welatên mîna Almanîya, Swêd û Awisturyayê kefaleta wan girtîyan li xwe digirin ku sizayê bidarvekirin an zîndana giran li wan hatîye birîn.

Armanca kefaleta sîyasî ev e ku rewşa kesên sizaxwarî bikeve rojeva medyaya cîhanê û bi vî awayî jî raya giştî hay ji wan gefan hebe ku li ser jîyana kesên sizaxwarî ne. Herwiha armanca kesên ku kefaleta sîyasî ya sizaxwarîyên kurd û îranî qebûl dikin jî ev e ku pêşîya bidarvekirina wan girtîyan bigirin.

Lê bi raya piranîya hiqûqnasan, kefaleta sîyasî ewqas bibandor nîne ku vê armancê pêk bîne. Kefaleta sîyasî tenê wê demê dikare karîger beku li welatekê serdestîya qanûnê hakim be û qanûn jî bi awayekî dadmend hatibin dariştin.

Lewra bi raya min pêngavekî bi vî awayî tenê alîkarîyê vê

»»»Dom R:6

»»»Doma R:5

çendê dikin ku rejîm di asta navneteweyî de û di raya giştî ya cîhanê de rûreştir bê dîtin. Helbet ew rûreşîya sîyasî dikare ji bo gelê Îranê erênî be. Lewra civaka navneteweyî dikare her ku diçe pêngavên hiqûqî yên bibandortir li dijî rejîmê rake û belkî hevdengîya civaka navneteweyî bigihîne astekê ku rê li ber destverdana mirovî xweş bike.

**P: Gelo rejîma Îranê biryara îdamkirina welatiyên hevwelatiyên dualî daye, welatê duyem dikare pêşî jê bigire an na? Eger wê biryarê cî bi cî bike çi encamek dikare li pey hebe?**

B: Girtin û sizadana îranîyên ku di heman demê da hemwelatîyê welatekî din in, ji bo rejîma Îranê bûbû derfetek û karteke givaşxistinê ji bo bidestveanîna serpişkîyên malî û sîyasî. Dema mirov li lîsteya wan girtîyan dinêre dibîne ku piranîya wan hemwelatîyê welatên zilhêz ên rojavayî bûne. Berê hemû hewla rejîmê ev bû ku bi rêya wan girtîyan zemînê ji bo sistkirina embargoya aborî an jî pevguherandina girtîyan xweş bike.

Lê vê dawîyê sepandina sizayê zîndana giran û darvekirinê li ser wan kesan ji hêla pergala dadwerîya rejîmê ve nîşaneya vê çendê ye ku rejîm gelek di tengezarîyê da ye. Ez ne bawer in ku rejîmeke terorîst a wekî rejîma hakim li Îranê ku tu rêzê li rêzikên hiqûqî nagire, bi rêya sizayên wan welatan bê hefsarkirin. Lê bêguman her ku rejîm sizayên zêdetir li ser şarwendên bîyanî bisepîne, dê rê ji bo pêngavên beranber yên xurttir xweş bibe.

**P: Gelo li pêka yasa ayîna Îslamê, kesên ku qetlên bi zanebûn encam dabin dikarî cezayê îdamê bo wan bibirî, lê, Komara Îslamiya Îranê, xwenîşanderan ku tenê daxwaza mafên rewa û azadiya xwe dikin wan îdam dike, hîn vê yekê çawa dinirxînin?**

B: Belê her wekî ku we jî amaje pê kir, di pergala hiqûqî ya îslamê da ku îro rojê li cîhanê di nava çend pergalên hiqûqî yên sereke da cih digire, qisas êk ji wan sizayan e ku ji bo kuştina biqest hatîye berçavgirtin. Tevî ku rêzikên hiqûqî yên têkildarî mafên mirovan vê sizaya nemirovane red dikin jî, lê belê em dibînin ku li gelek welatan ev siza hîn jî li ser bingeha ayîna îslamê tê cîbicîkirin.

Lê rewşa îranê gelek cuda ye. Rejîm ne tenê bidarvekirinê wekî sizayê kuştina biqest cîbicî dike, di heman demê da vê sizayê ji bo lîsteyeke dûr û dirêj a tawanan berçav digire ku di qanûnên vî welatî da cih digirin. Bo nimûne mirov dikare amaje bi tawanên mîna dijminîya xwedê an têkdana ewlehîya neteweyî bike. Di heyama çend mehên borî da, me dît ku dadgehên rejîmê di biryardanên xwe da şîroveya herî vekirî ji bo wan sernavên tawanan bingeh digirin.

Armanc ji vê çendê ev e ku gelên Îranê û bi taybetî gelê me çavtirsandî bikin. Li ser bingeha wan şîroveyên vekirî, kî pêngavekê ji bo xwastin an xwedîderketina ji maf û azadîyên xwe rake, dijminê xwedê û têkderê ewlehîya neteweyî tê dîtin û sizayê bidarvekirinê li serê tê sepandin.

Lewra ev bidarvekirin di çarçoveya wan qanûnan da pêk tên ku ji hêla hêza qanûnsaz a Îranê ve hatine dariştin û pesendkirin û ji hêla rewabûn û dadmendîyê ve di asta herî nizm da ne.


**Sabîr Ebdulahîzad**
**Pisporê Maf**

# Şoreşa Jîna yê heya serkevtina yekcarî berdewam be



**N: Zahid Esedî**

Zêdetir jiçend heyvan e ku li Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî şoreşeke girseî û bingehîn û bêsînor di çarçoveya hêza erdnîgariyeke diyar de bi dijî yek ji rejîm û sîstemên herî kevneperest û dîktator a di rojhilata navîn de anku rejîma Komara Îslamî a Îranê dest pê kiriye. Pêşengên vê serhildanê kurd in û bo cara yekemîn û li dîv kuştina bi naheq û hovane a keça Kurd “Jîna Emînî” bi destê hêzên mirovkuj a Komara Îslamî, û helwest şoreşvanî û xelkê Kurdistanê, şorişek berfireh hemû civatgeha Îranê bi xwe ve girt. Ji wê rojê heya niha li Rojhilatê Kurdistanê bêhna şoreşek nû ku binavê “Şoreşa Jîna Emînî Şîn dibe” tê. Bêguman ev şoreş bi dirûşmeya “Jin Jiyan Azadî” bi pêşengtiya jinê serî hildaye. Bi dirêjahîya temenê dîktato a Komara îslamî a îranê, Kurdistanhertim weke navendeke girîng a serhildanên siyasî bûye qada gûherandin-vegûherandinên dîrokî. kurd hem li dijî paşverûtiyê û hem jî li dijî rejîmên dîktator û yek ji wan rejîma axundî a Xomeynî rawestiyane. Bi bedelên giran û bêhempa destkeftiyên mezin kirine para xwe û doza mirovahiyê. Kurdistan hertim navenda berxudan û serhildanên girseyî bûye bi dijî deshilatên dîktator.
Şehîd Dr. Qasimlo Di gotinek xwe de wuha dibêje: “Ez bi aşkerahî dibêjim ku em kurd li Kurdistanê hêza yekem bûn ku me li dijî rejîma Xumeynî berxwedan kir û ez bawerim ku dîsa em ê bibin hêza dawiyê jî di qada têkoşîna li dijî vê rejîma dîktator de.”
Li pey 43 salan ew rastiyên ku Dr. Qasimlo li ser gotina wan bi israr bû îro derketine holê.
Îro li rojhilatê Kurdistanê



şoreşeke bingehîn û bêsînor di çarçoveya hêza gel an jî erdnîgariyeke diyar de dest pê kiriye û ew şoreş yê heya herifîna rejîma mirovkuj a xomynî û anîne serkara hikûmetek dimokratîk û gelî berdewam be.
Ger neteweyek azadîxwaz ji azadiyê wêdetir tiştekî din hilbijêre wê her tiştê xwe winda bike. Hêzên êtlaata Îranê bi hemû rêbazan zextên giran anîn ser malbata Jîna, lê wan serê xwe netewandin û li ser kêlika gora wê ev tişt nivîsandin: “Jîna navê te bû sembola jin û azadîxwaziyê”. Êdî ji wê rojê û şûn ve li her dera Kurdistanê dê û bavê her şehîdekî bûn rêberên siyasî. Heta ku ew neaxivin, mirov dikare texmîn bike ku zarokên wan ên şehîd di kîjan malbatê de û bi kîjan perwerdeya bilind a siyasî-civakî mezin bûne. Li Kurdistanê merasima oxirkirina cenazê her şehîdekî/ê konferanseke neteweyî ye.
‘Şoreşa Jîna’ weke şoreşeke nû li Rojhilatê Kurdistanê ku piştî kuştina Jîna ya 22 salî li bajarê Tehranê paytexta dagîrkerên Îranî bi destê polîsên exlaq û ji bo parastina girîngtirîn nirxên siyasî/îdeolojîk ên desthilata Îslamî ya vê Komara Îranî, dest pê kir û heya qutkirina destê vê rejîmê li ser axa Rojhilatê Kurdistanê dê berdewam

»»»Dom R:7

## Nerîna Lîderan



**“Ebdulhemîd Mewlevî:”**

Ebdulhemîd: Mirovekî 80 salî nikare ciwanên Îranê fêm bike.



**“Maulvi Mohammad Hussein Gergij”:**

Hikûmeteke ku ne bi gel re be, ne layîqê hikûmetê ye.



**“Volodymyr Zelensky”:**

Em gavên guncav ji bo xurtkirina leşkerên xwe di şerê Donbasê de diavêjin.



**“Celîl Rehîmî Cehanabadî”:**

Ne mimkûn e ku hûn di aboriya girtî ya akvaryûma ku we derî û dîwar lê girtiye de rikeberiyê bikin

»»»Doma R:6

bike. Şoreşa Jîna bilindtirîn nirxên mirovatiyê aniye ser zimanê bi milyonan azadîxwazên Kurdistanî û ne Kurdistanî û semboleke cîhanî ya parastina jiyanê berhem aniye. Pêvajoya ku em niha tê de derbas dibin pêvajoyekî pir giring û ji bo herkesî derbasdare. Di vê şoreşa ku bi pêşengtiya jinê serî hildayî de çi ji destê kê were divê bike. Ji ber ku divê gelê me baş bizane ger ku ev şoreş bi sernekeve wê Komara îslamî a Îranê bi sedan kesan bi cezayê darvekirinê re rû bi rû bihêle. Lê eger ku ev şoreşa jinê bi awayekî serkeftî bi dome, wê serkeftina şoreşa jinê a Rojhilatê Kurdistanê ku bi “Şoreşa Jîna Emînî” hatiye hildane de wê li tevahî cîhanê bê naskirin û deng bide.
Komara Îslamî wek jêdera hemû tepeseriyên curbicur û bingeha hemû bandeke mafya di bin tirsa rejîmeke siyasî de, heya niha hemû ezmûnên tepeserkirin û tawankariyên xwe yên li Çînê bi kar aniye. Rejîmê xwast vê serhildanê bitepisîne, lê di têkbirina gel û şervanan de bi ser neket. Rejîm di heyamê derbasî bûyî de bi hezaran xurtên azadîxwaz yê Kurdistan û Îranê bi giştî girtin û hevrîşî eşkenceyên herî hovane kirine û bi dehan xurtên azadîxwaz li darvekirine û rewşekî evlehî û polîsî bi ser civatgeha Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî de sepandiye, bi merema bêdengkirin û tirsandin û tepeserkirina dengeên nerazî yên welêt.
Çanda berxwedanê her roj dengê azadiyê li kolanan bilindtir û bihêztir dike. êdî ne bi şîn û girî, bi ruhê berxwedaniyê ku serkeftinê misoger dike, bi tilîliyên azadiyê gelê me, şehîdên xwe pêşwazî dike. Ev ruhê ku mizgîniya azadiyê dide mirovatiyê. Di zanîngeh û dibistanan de zanista civakî bi pêşengtiya keç û xortên ciwan digihîje wateya xwe ya rastîn. Rolê zanîngehan pir giring bû, ruhê şoreşê parast û nehişt şoreşa gelan ji hev û din qut bibe. Ev jî nîşan dide ku hemû çîn, bawerî, netewe hebûna xwe di vê formula efsûnî de dibînin. Ji xwe ev bandor, şêwazên bi vî rengî di çalakiyên piştgiriyê de derkete holê.
Di nav kelecana berxwedanê de her dirûşmek, peyamek e, helwestek û îfadeya hişmendiyekê ye. Dîwarê hemû kolan û qadan, deriyê dibistan û zanîngehan bi dirûşmeyên ‘Jin jiyan azadî‘tên xemilandin. Dilê zarokên gelê me li kolanan bi ‘Jin jiyan azadî‘ lê dide, ruh û kelecana azadiyê sed qat xurtttir dike. Dayikên me, bi vê dirûşmeya efsûnî şehîdên xwe pêşwazî dikin. ‘Jin jiyan azadî‘ îrade û hestên her mirovekî zindî kirin û xwedî li nirx û hebûna xwe derdikevin. Êdî gelê me xwedî hêza xwebirêve birinê ye. Şoreşa jîna yê heya têkvepêçan û herifîna rejîma axundî a Îranê û avakirina sîstemek demokratîk û fedîral berdewam be.

## Navenda Hevkarî: Biryarnameya bi terorîstnasandina Spaha Pasdaran pêngavek dîplomatîk a bicih e

Di civîna Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê de, pêşwazî ji biryara parlemana Ewropayê ya derheq bi terorîstnasandina Spaha Pasdaran a Komara Îslamî ya Îranê hate kir.
Roja Pêncşemî 29ê Befranbara 1401an a Rojî, kombûna asayî ya Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê bi rê ve çû.
Destpêka kombûnê rêzdar “Umer Îlxanîzade”, Cihgirê Sekreterê Giştî yê Komelê, wek berpirsê dewreyî yê navendê, mijar û xalên kombûnê ragihand û di axavtina destpêkê de li ser kar û hevahengiya zêdetir ya navendê di rewşa niha de û û di meşa şoreşa Jînayê de tekezî kir.
Di beşeke din a karê kombûnê de, rêzdar “Mihemed Nezîf Qaderî” Berpirsê heyeta PDKÎ li Navenda Hevkariyê digel beşdarên din ên kombûnê rapora kar û çalakiyên wê dewreya Navenda Hevkariyê helsengand ku berpirsayetiya wê di stuyê Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê de bû.
Di behsên siyasî de, rehendên cuda ên şoreşa Jîna û meşa nerizayetiyên berfireh ên niha ku seranserê Îranê li xwe girtiye helsengand û li ser piştevaniya xwe ji xelkê azadîxwaz ên Kurdistanê tekezî kir.
Her di vê kombûnê de li ser pêwîstiya zêdetir a xurtkirina hevpiştî û hevkariyan tekezî hete kirin ku niha di navbera gelê Kurd û netewên din ên Îranê de dirust bûye û li ser hewlên navendê ji bo pêkanîna çetreke hevkariyê bo hemû aliyên siyasî yên Kurdistanê, diyalog û gotûbêjeke zêde jî digel opozîsiyona Îranî, tezkezî hate kirin.
Civînê bi girîngiyek zêde ve çalakî û pêşengiya jinan û hemû tex û qatên din ên civaka Kurdistanî di wê şoreşê de helsengand û tekezî li ser piştevaniya xwe ji berdewamiya çalakî û xwenîşandanan li navxwe û derve kir.
Navenda Hevkarî destxweşî ji tev çalakvanên siyasî û endam û alîgirên hizban û xelkê azadîxwaz li derveyê welat kir ku bi beşdariya berdewamî ya wan di aksiyon û xwenîşandan de piştevanê xelkê şoreşger ên navxweyê Kurdistanê û şoreşa Jînayê bûn.
Navendê di beşeke din ya vê civîna han de balkişand li ser vê yekê ku siyasetên Komara Îslamî ya Îranê yên dij bi azadîxwazan, serkutkirina xwenîşanderan, îşkencekirin û kuştina girtiyên siyasî nayêne guherîn û ev rejîme her li navçeyê jî piştevanê û dabînkerê girûpên terorîstî ye.
Her di vê pêwendiyê de Navenda Hevkarî biryarnameya parlemana Ewropayê ya bi terorîstnasandina Spaha Pasdaran, bi pêngavek girîng a dîplomatîk zanî û hêvî xwast ku di kombûna Yekîtiya Ewropayê de jî, ev biryare bê piştrastkirin û di berdewamiyê de givaşên zêde jî bixine ser rejîma Îranê.
Di beşa dawiya kombûnê de Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, berpirsayetiya dewreyî ya Navenda Hevkarî vergirt û biryar da li pey wan plan û pirojeyan bikeve ku di kombûnên navendê de biryar li ser wan hatiye dan.

# Bas ji yekîtiya opozisyon û çend xalan



N: Areş Salih
W: Hesen Mukerem

Piştî destpêkirina şoreşa Jînayê li Îranê bas ji pêkhatina yekîtiya di nav opozisyoneke gerimtir ji berê hatiye gorê, di vê pêwendiyê de civaka Kurdistanê û aliyên Hizbî ji berê zêdetir dilnîgeraniya xwe li derheq şêwaza lihevkirina Hizbê digel opozisyona Îranê nîşan didin û her kes û aliyek bi hişmendiyekê bas ji çarçêveya kiryar û kar kirin di vê pêwendiyê de dikin, ya herî balkêş ev e ku eger beraxwe bidin bi vê hişmendiyê, her yek ji wan heta asteke kêrhatî tên ber çavan û basên wan balkêş in, lê, hevdem encamên wan di piraniya deman de pir ji hev dûr in, wate aqilmendiya her yek ji wan aliyan ku çi li dij û çi di berjewendiyên nêzîkbûn bi opozisyonê de diaxvin, û xwediyê lojîka xwe ne, û heta asteke xuya tevî cudahiyan piraniya wan drust tên xuya kirin, ev yek bixwe nîşana alozbûna rewşê ye, di vê gotarê de di despêkê de bas ji wan fakitoran dikin ku rewş aloztir kirin, piştire bi bê axavtin li ser vê yekê ku kîj ji wan hişmendiyan dirust in, ev pirensîpên han tên bas kirin ku weke hizb hewceyeli ber çavên me bin.

Di detpoêke de hewce ye ku bê gotin yekem faktor bo alozbûna arîşeyê hebûna dîwareke bilind di nebûna baweriya di navbera me de weke gelê Kurd û neteweya serdest de ku heye.

Di wan çend dehkên derbasbûyî de, neteweya serdest netenê ku dengê xwe nexsitiye kêlega dengê Kurd û netenê serkuta bêrehmane ya gelê Kurd ji aliyê Hikûmetê ve şermezar nekiriye belku di piraniya deman de tevî dijîberîkirin digel hikûpmetê, rewatî dane bi vê serkutkirinê û piştevanî ji vê hikûmetê kirine bona serkutkirina tevgera rizgarîxwazî ya gelê Kurd, û çavnhêriya vê yekê ye ku ev dîtingeha bişevek, mehek, salek û deh sal guherînkarî bi ser de hatibe, ev ne çavnhêriyeke hişmendiye û ne jî li ser esasa rastiyê ye.

Faktora din ya ku vê mijarê aloztir dike mijara opozisyonê ye ku hilgirê ti şêwaz li erêkirina mafên gelê Kurd nine. Ti yek ji ev hêlên giştî yên ku aliyên opozisyon bas jê dikin hilgirê wan xalan nine ku, nîşana pejrandina piloralîsma etnîkî bin û mafê pêkhateyên cuda bitaybet neteweyên di nav wan de erê bikin.

Hinek basên giştî an bi gotina Farsan gotinên giştî ku hilgirê şiroveya vê gelek cuda bin, nikarin bo me bibin pêwer û milak ji bo vê ku li ser daxwazkariyên opozisyonê biryarê bistînin. ji bo mînak em nikarin li ser vê biryar bistînin ku kesek an aliyek bêje me bawerî bi demokrasiyê heye ji ber vê ku desthilata demokratîk di cîhana îroyî de, aliyeke gelek berbelav di sîstema desthilatdariya cuda ji xwe digire, ku li aliyeke teyfê, ev hikûmetên han in ku hatine hilbijartinê tenê merca dabînbûna demokrasiyê dibînin.

Herwisa têgeha mafê mirovî têgeha berbelav ya ku tenê wan belgeyan ji xwe nagire ku di çarçêveya saziya Neteweyên Yekgirtî de û li ser navê mafê mirov hatiye pejrandin an mafê mirov weke mijarê dibîne. Ev mafên aliyê kêm wan mafan ji xwe digire ku heta Komara Îslamî jî, beşek zêde ji wan perjrandiye. Mafê mirov bo mînak di çarçêveya Yekîtiya Ewropayê de gelek pêşkevtîxwazanetir ji vê mafê mirovî ye ku di çarçêveya Neteweyên Yekbûyî de û ev jî ji ber vê ye ku rejîmên nademorkatîk yên di nav Saziya Neteweyên



Yekbûyî de, ti carî rê ji wan re nehatiye dan ku bêjin ji bo me mafê mirov rohn bikin ku gelo ev mafê mirov hilgirê wan xalan ku Yekîtiya Ewropayê wan bi fermî nas dike? Gelo hilgirê mafê gelê Kurd weke neteweke bo birêvebirina xwe û diyarîkirina çarenivîsê heye an na?

Ji aliyek din ve û tevî wan nezelaliyên ku aliyên Farsan hene ku bi awayek berdewam mejûlî vê ne ku neteweyên bindest yên Îranê bidin sondê ku parêzerê yekparçeya Îranê ne. Ev yeka di halekê de ye ku bernameya siyasî ya hêzên Kurdî ji bo mînak ev ye ku di çarçêveya Îraneke demokrat û federal de mafên gelê Kur dabîn bikin. Xwe ev bernameya pêş merca parastina yekparçeya Îranê ye. Û di rastiyê de li ser vê yekê tekez dike ku yekparçeya xaka Îranê dane sondê û sivikatîkirin bi neteweya wan li ser vê esasî bo bas dike ku ev alî dixwazin partiyên nû yên Kurdî ku dikarin pêş bi zêdexwaziya desthildatê ji aliyê wan ve bigrin û di panhiya siyasetê de derbixin û wan dûr bixînin her ji ber vê yekê ye ku hewcey partiyên Kurdî ji vê yekê fedî nekin û bêjin bernameya siyasî ya me hilgirê parastina yekparçeya Îranê ye û me ti dijberiyek digel vê axavtinê nine.

Faktora sêyem bo aloztir bûna arîşeyan heqîqeteke ku em weke gelê Kurd û bitaybet siyasiyan li hundr de lê fêm dikin herçend ku hindek ji me xwe lê gêl dikin. Ev mijara jî eve ku guherîna rewşa gelê Kurd hevterîbê guherîna rejîmê nine.

Guherîna rejîmê di dema niha de weke pêş merc bo guherînkariya xwazyara me ye, lê, ya ku merca tevawkere an mercan be nine.

Di heqîqetê de, pêwendiya serdest û bindest ya di navbera neteweyan de girêdayî rejîma siyasî nine belku girêdayî rewşa yekgirtî an welat û şêwaza forma girtina vê wilayetiyê ye.

Û ev yeka tenê damezravên siyasî yên weke damezraveya popolîstî, perwerde ne, zimanê fermî yê welat û … hwd, ji xwe digire. Belku damezravên exlaqî û hizrî ku wate bexişin ji xwe digire her ji ber vê yekê ye ku, ev guherînkariyên ku em di nav hundrî xwe de dixwazin gelek kûr e ji guherîna rejîmê.

Her ji bo vê mebestê me hewcehî bi yekê heye ku ji bo me zelal be ku ji aliyê opozsiyona fars ve di heqîqetê de û di kûrahiya fêmkirina wan de digel wan guherîkariyan hene, rastiya vê eve ku ew berewajiyê vê nîşan daye ku em jî dizanin herifîna rejîmê bi wateya herfîna rewşa siyasî nine tevahiya damezravên polîsî û leşkerî, zimanê fermî perwerde û hemû ji wan herfîna rejîmê dimîne û dikeve destê her hereketeke fars ku piştî herfîna rejîmê bikare bizmarê xwe li Tehranê zûtir daliqîne. Û piştire Tehran bi hebûna navenda siyasî û rejîma siyasî û bi parçebûna wan hemû damzraveyên nerim û dijwar yên serkut dubare tê bo serkutkirina Kurdistanê û

»»»Dom R:9

»»»Doma R:8

diyarîkirina yaku çawa ber bi pêş ve here.

Li hember de ev axavtinên ku em berî her tiştî weke pirensîp hewce ye li ber çav bigirin eve ku yekemîn û girîngtirîn tişt bo partiyeke siyasî pêgeha civakî ya vê partiyê ye.

Opozisyona fars ji xwedê dixwaze ku em bi mercên wan razî bibin û ne ji ber vê ku ev wisa dizanin ku bi hev nerînbûna me rejîm zûtir diherife. Ev ji hemiyan baştir dizanin ku li destpêkê de me bi bê wan li dijî vê rejîmê tekoşîn kiriye û herwisa baş dizanin ku girîngitirîn faktor ji bo herfiandina rejîmê her fars û Tehran e.

Ev bi mebesta cuda kirina partiyên Kurdî ji bestênên civakî li peyî hev hevaltiya me ne. Ev wisa dizanin ya ku arîşeya Kurd nûneratî dike ev partî ne û eger ev partiyane pêgeha civakî ya xwe ji dest bidin, û nekarin nûneratiya gelê xwe bikin, ya ku girîngî nedin bi li hundra civakî ya xwe û bi bê li berçavgirtina wan vê bedenê biryarê bistînin, vê demê bende jî dev ji wan partiyan ber didin.

Her ji ber vê yekê dikarin bêjim ku yekemîn û demokratîkitirîn esasa ku me hewcehî pê heye daku niha me di vê pewendiyê de berçav bigirin mana digel bedenê ye û pêgeha civakî ya me ye. Bi bê bedene em weke partiyên fars ji me tê û dibin bi çend aliyên cuda ji civaka xwe.

Mijara duyem ku dibe li berçav bigirin zelalbûn li hember bedena me bixwe de ye, û daxwaziyên me diyar in. Û eger ji ber her danûstandinekê bo gihîştin bi vê qenaetê ku tevlî bin an nebin hewceye ku bi tevahî û bi zelalî heta vê astê ku derbê ji ewlehiya partiyê nede cemaweriya xwe di mikanîzima gihîştin bi vê biryarê agehdar bikin.

Piresîpa sêyem ku hewceye di vê pêwendiyê de li berçav bigirin eve ye ku niha dema vê ye aliyeke pirofeşinal û hişmedî ya me di rû bi rû bûna digel opozisyona Îranî me hebe. Ev dîtingeha li ser esasa berjewendiyan hatiye damerzadin.

Dostî û dijmntiya ti aliyekê ji bo dostî û dijmnatiya hertmî û heta hetayî nine. Ya ku faktora sereke ji bo me dana berhev a destkevtan û mezaxta di pêwendiyên digel berjewendiyên partî û Rojhilat de. Wate em dikarin digel hemû kesî pêk bên dema ku di berjewedniyê me de bin.

Pirensîpa dawî û girîng doza gelê me ye. Felsefeya hebûna me gelê Kurd û bernameya mer ji bo çareseriya arîşeya gelê Kurd e. Her pêngavek ku vê mijarê pişt guh bixe, felsefeya hebûna me dibe jêr pirstarê. Herçend ku em dikarin hinek karên hevpar digel hinek aliyan encam bidin, lê, nikarin tevlî pêwendiyekê bin ku me berprisyarê mijarekê dike ku li dijî felsefeya hebûna me ye.

Wate em nikarin tevlî yekîtiyekê bin ku aliyê kêm nikare piloralîsma etnîkî ya weke eslekê erê neke.

Bikar anîna peyva piloralîsma etnîkî herçend ku bedene hilgirê hemû çarçêveya hizrî ya me nine, lê, ev peyva vê derfetê dide bi aliyê hemberî me ku bikare hêsantir li hember daxwazkiriyên me kurt bên, û di encamê de, ev kurthatina heman bandor hedibe ku erêkirina edebiyata me ye.

Ev yek bi vê wateyê nine ku em di edebitiya xwe de ku pir neteweyîbûna Îranê ye dev jê ber didin. Lê, bê vê wateyê ku xalek bo aliyê hemberî xwe pêşniyar dikin ku erêkirin ji bo wan hêsantir be û di encamê de em bi bernameya xwe ku birêvebirina me bixwe bi destê me bixwe û mafên gelê Kurd di çaçêveya Îranê de nêzîk dike.

Di dawiyê de hewceye bêjim ku, tevlînebûn bi yekîtiyê bo herfîna rejîmê ji dest dana derfeteke ecêb nine. Her di destpêkê de ezmûnan nîşan daye ku egera vê ku ev yekîtiya serbikeve gelek kême, wate rengê vê yekê nade ku yekîtiya wiha encama vê hebe û bikare pêgeha civakî ji xwe re peyda bike.
Duyem piştî herfîna rejîmê yekîtiys han nikare bimîne, û hevkêşe bi tevahî tên guherîn û vê demê alî li şûna hevalgirî û yekîtiyeke micidtir digerin. Sêyem çi ev yekîtiya serkevtî be û çi jî serkevtî nebe, egera zêde heye ku em weke gelê Kurd li şûna herfîna rejîmê neçar bin ku pişt bi hêz û pêgeha civakî ya xwe girê bidin bona ber bi pêşve birina bernameyên xwe.
Û her ji ber vê yekê ye hewce ye ku agehdar bin di lîstikên siyasî yên niha de bi biryarek bilez mezaxteke civakî bi ser xwe de nesepînin û neçin nav lîstikekê ku sermayeya xwe ku pêgeha me ye ji me bistîne.

**Hewceye agehdar bin ku fars dibêjin: "Ji ber helvalê nekevin di nav beroşê de".**

**Areş Salih Nûnerê**

**PDKÎ li Washingtoon**

## Çalakiyên banghêjî bi hilkevta ٢ê Rêbendanê li bajarê Rojhilatê Kurdistanê berdewam in

Endam û alîgirên PDKÎ li bajarên "Mihabad, Pîranşar û Merîwan"ê bi hilkefta 2ê Rêbendanê salroja avakirina Komara Kurdistanê çalakiyek banghêjî lidar xistin.

Şeva Çarşemî 28ê Befranbarê, endam û alîgirên PDKÎ li bajarên "Mihabad, Pîranşar û Merîwan"ê bi belavkirina tirakt û siloganên taybet bi 2ê Rêbendanê û herwisa daliqandina pilak kartên taybet bi salroja yekemîn Komara Kurdistanê, û hatina vê roja pîroz bilind nirxandin.

Ew cihên ku li bajarê Pîranşarê çalakî wir de hatine lidarxistin wiha ne: "Girdiksipiyan, Peswê, Serînçavê, Serokanî, Endêzê, Şînavê û Balaşar, gundê Qebirê Husên, mizgevit, Bêhdaşt, xwandingeha Xirape,"

Herwisa evîndarên rêbaza Qazî û PDKÎ, li bajarê Mihabadê, li cihên weke: "Guyktepe ya Şarwêranê, gundê Dêmeweran, Mehalî Şazde, çalakiyên taybet bi 2ê Rêbendanê lidar xistin.

Li bajarê "Merîwan"ê endam û alîgirên PDKÎ bi bilindkirina alaya Kurdistanê û belavkirina tirak û siloganên taybet û herwisa belavkirina sirûdên şoreşgerî yad û bîra wê rojê bilind ragirtin.



PDKÎ tevî sipas kirin û mandînebûnyî gotin bi endam û alîgirên xwe li navxweyî welat de hêviya saxî û tendirûstiyê û berdewam bûn ji birêvebirina erkên hizbî û netewî bo wan dixwaze.

## Di salvegera avakirina Komara Kurdistanê de

# ‘’Hemû xaka Rojhilatê, bûye bi kela Demokratê’’



N: Selîm Zencîrî




**Di salvegera avakirina Komara Kurdistanê de**

**‘’Hemû xaka Rojhilatê, bûye bi kela Demokratê’’**

Eşkere ye ku 2’ê Rêbendanê, salvegera avakirina Komara Kurdistanê di dîroka gelê Kurd û Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê de cih û pêgehek taybetî û bilind heye. Pêgehek ku piştî 77 salan li kopika viyan û xoşewîstiyê de ye û weke stêrkek geş di esmanê xebat û tekoşîna kurdan de dibirisqe. Rêbaz û armancên ku bûne bingeh bo jidayîkbûna Komara Kurdistanê, heta niha jî, rêbaz û armancên Hizba avakerê Komarê, hizba dahênerê navê pêşmerge û hêza pêşmerge, anku Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ne.

Îsal di demekê de em ber bi 77’mîn salvegera vê boneya dîrokî ve diçin ku erdnîgariya cihê tekoşîn û desthilatdariya Komarê ku çarçoveya cuxrafiyayî a Rojhilata Kurdistanê pêk tîne, serê 4 mehan e ku tevî gelên din ên Îranê li dijî dagîkerî û dîktatoriya rejîma terorîstî ya îslamî a Îranê serî hildane û bi hizûra xwe ya berdewam û dana bedelên zaf, pêpikên deshilatê sist û asoya serkevtinê nizîktir kirine.

Têgeh û durûşmên ku bûne hêvênê pêkhatina Komarê û weke tîrêjên roja armancên Komarê bûn, heman têgeh û armanc in ku hizba avaker û mîratgirê Komarê jê re dixebite. Têgehên weke azadî, maf, wekhevî, dadperwerî û aştî ku îrorojê ji nû ve xwe di durûşma ‘’Jin, Jiyan, Azadî’’a şoreşa Jînayê de pênase dikin û ne tenê Rojhilata Kurdistanê, belkî sînorê hemû Îran û cîhanê jî dagirtiye, û bo carek dinê, Kurd û doza rewa ya Kurdan û mafxwazî, azadîxwazî û mezlûmiyeta vî gelê bindest ji dunyayê re selimand. Ev yek jî selmînerê xebata rewa ya tevgera Kurd li Rojhilatê bi pêşengiya Hizba demokratê û hizba avakerê Komarê ye. Partiyek ku piştî nizîk bi heşt dehikên xebatê, serbarê ewraz û nişîv û nirx û bedelên zaf, û pîlanên qirjên dujminê hov û propagendeyên wê, hêj li ser piyan û serbilind e û di kûrahiya dilê xelkê Kurdistanê, bi taybet ciwan û jinan de cihê xwe vekiriye.

Ji xwe nine ku dengê durûşma ‘’Qasimlû Qasimlû, riya te dirêjî heye’’ yan ‘’Hemû xaka Rojhilatê, bûye kela Demokratê’’ şeqamên Rojhilatê dagirtiye û bûne bi siloganên berdewam û sereke yên serhildêran û di guhên dost û dujminan de deng vedidin. Eve jî şanaziyek mezin e bo hizba Demokrat ku ji aliyekê ve siyaset, exlaq, pirensîp û armancên wê di nav piraniya xelkê de ewqas cîketî û cihê baweriyê ne, û ji aliyê dinê ve jî, piştqahîm e bi hêza bêdawî a xelkê Rojhilatê. Hêzek ku seng û giraniya Hizb Demokrat û rêberên şehîd pitir ji her demekê di vê şoreşê de nîşan da û hiş û heybet serê dujmin de nehêla û her kes heyrîmayî kir. Şanazî, sermiyan û pêgehek ewqas mezin ku bi çi alavekê nahê qiyaskirin û pîvîn, û çi kes û aliyek nikare înkara rol, giranî û pêgeha wê bike û di hevkêşeyên piştî herifîna rejîma nehs û totalîtar a melayên Îranê de berçav negre.

Niha ku em yad û bîranîna 77’mîn salvegera avakirina Komara Kurdistanê pîroz dikin, dibînin ku şoreşa Jînayê li ser destê vê hêza bêdawî a xelkê Kurdistanê derbasî qonaxek hestiyar bûye.
Şoreşek ku serbarê rewşa mîlîtarîstî û tepeseriyên hovane ên rejîmê, bilez pêşde diçe û asoya serkevtina xwe, bi herifandina rejîmê re girê daye. Şoreşek ku roj bi rojê piştevanên zêdetir ji xwe re peyda û rejîmê îzole, û ji cîhana azad vediqetîne.

Cihê keyfxweşiyê ye ew hêza zarokkuj û hov a Spaha Pasdaran ku serê 44 salan e gelê Kurd li hemberî wê de berxwe dide û destê wê bi xwîna hemû gelên Îranê sor bûye, weke hêzek terorîstî ji aliyê Yekîtiya Ewropayê ve hat naskirin. Pêngavek direng, lê karîger û li cih û demek hesas de ku şoreşa Jînayê hêj berdewam dike. Bi vê pênaseya terorîstî a Spaha Pasdaran a rejîmê jî, xebata gelê Kurd û gelên din ên Îranê niha şûnde di çarçoveya xebata dijî terorîzmê cih digre û rewatî û meşrûiyetek navnetewî peyda dike.

Lewre ew yek dikare bandorek erênî li ser pêvajoya vê xebata mafxwazane û rizgarîxwazane bike û dikare derencamên xirab bo rejîmê û pêvajoya herifîna wê jî bileztir dike.

Bi berçavgirtina rewşa hundurîn û herweha givaşên derekî û daxistina deriyan bi ser rejîmê de, pêvajoya guherînkariyên bingehîn jî dest pê kiriye, lewre hewce ye Kurd û hizba mîratgirê Komarê bîrdanka dîrokî a xwe baş bidin şuxulandin û durûşma manadar û siyasî a xelkê Rojhilat û Îranê ‘’Mirin ji bo stemger, çi şah be çi rêber’’ku li ser bingeha ceribandina her du rejîmên faşîstî ye, li siyaset û hevalbendiyên xwe de berçav bigrin.

Ji berku ne tenê raman û hişmendiya rejîma herifînerê Komarê û bikujê Pêşewayê Serkomar û herweha rejîma îslamî û terorîstî ya cihgirê wê ji hev cuda nine, belkî du rûyên yek dirav in.

Wate îrorojê mentalîteya şopîner û alîgirên her du rejîmên paşatî û rejîma Îslamî jî yek tişt e û li dijî maf û daxwaziyên rewa ên gelê Kurd û gelên din ên Îranê ne.

Têjikên wan faşîstan bi hincetên bêwata û propagendeyên jehrî wekî Mar xwe veqelistine û dixwazin vê şoreşê berxwar û deskevtên wê jî talan bikin.

Lê dibe gelê Kurd û gelê din ên Îranê serbarê bihêzkirin û parastina yekîtî û hevxebatiya xwe, hişyarê dengê piyên faşîzmê û şovenîzma neteweya serdest bin ku dixwaze li jêr navek din de, carek din temenê xwe dirêj bike.

Lewre nabe rê were dayîn ku carek din dîroka dagîrkarî, faşîzm û totalîtarîzmê, xwe li ser gelên Îranê biceribîne yan dubare bike.

**Pîroz be 77’mîn salvegera avakirina Komara Kurdistanê**

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Serdeşt; Mamosteyek olî yê Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve hate girtin

Roja Pêncşemî 29ê Befranbara 1401an a Rojî, mamoste Hesen Kohî, pêşnimêjê Înê yê mizgevta Bazar Şehr a Mîravaya Serdeştê ji aliyê hêzên ewlehî ve hate girtin.

Ew mamosteyê olî yê Kurd bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye girtin û bo cihek nexuya hatiye veguhastin.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê, ti zanyariyek derheq cihê ragirtin û tohmetên ku bi ser navbirî de hatine sepandin ber dest nînin.

Her di vê pêwendiyê de, êvareya roja Yekşemî 25ê Befranbarê, Hesen Fethî Xezirlekî, pêşnimêjê gundê Qaziliyan yê ser Bokanê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû girtin.

## Rêjeya welatiyên binçavkirî li bajarê Pîranşarê bûn 10 kes

Di berdewamiya binçavkirina welatiyan li bajarên Rojhilatê Kurdistanê de roja Çarşemî 28ê Befranbarê 4 welatiyên din yên weke: “Wefa Resûlîazer, Mubîn Husêynizade, Ferxedîn Omîdfer û Qadir Omîdfer” ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîma Îranê ve hatin binçavkirin.

Ji aliyek din ve her di vê rojê de wate roja Çarşemî 28ê Befranbarê 6 welatiyên din her li wî bajarî de yên bi navên: “Teha Resûliyan, Ehmed Ebdullapûr û Şaho Ebdullapûr, Sîna Deşmîr, Qadir Mihemedpûr û Mohsin Qadirî ” ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Heta dema belavkirina vê nûçeyê ti zanyariyek ser rast derheq tohmetên sepandî û cihê mana wan 10 welatiyên xelkê bajarê “Pîranşar”ê ji ber best nîne.

## Sê welatiyên xelkê bajarê Pîranşarê hatin binçavkirin

Sê welatiyên xelkê bajarê Pîranşarê yên bi navên “Teha Resûliyan, Ehmed Ebdullapûr û Şaho Ebdullapûr” ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Roja Çarşemî 28ê Befranbarê çalakvanê medenî Teha Resûliyan ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hat binçavkirin û bo cihek nexuya hat veguhastin.

Herwisa du welatiyên din ên bi navên “Ehmed Ebdullahpûr û kurê wî yê bi navê Şaho Abdullapûr” ji aliyê hêzên serkutker ên ewlehî yên hikûmetê ve hatin binçavkirin û bo cihek nexya hatine veguhastin.

## Çar welatiyên Kurd bo bajarê Îranşehir ya parêzgeha Sîstan û Belûçistanê hatin dûrxistin

Roja Înê 23ê Befranbarê 4 welatiyên Kurd yên bi navên “Mensûr Şarban” “Hejar Ebasî” “Hîwa Qurbanî Eqdem” û “Mihemed Eliyasî” yên xelkê bajarê “Bokan”ê bo bajarê “Îranşehir”ê yê girêdayî bajarê Sîstan û Belûçistanê hatin dûr xistin.

Roja Yekşemî 19ê Befranbarê, ew 4 welatiyên Kurd ji aliyê taya 1 a dadgeha Şoreş ya bajarê “Mihabad”ê bo bajarê “Îranşehr”ê hatine dûrxistin.

Pêka dadnameyên dadgehê “Mensûr Şarban û Hejar Ebasî” bo heyama 5 salan hatine dûrxistin û “Hîwa Qurbanî û Mihemed Eliyasî” bi 3ê salan dûr xistinê hatine cezadan.

Ew 4 welatiyên Kurd, sala 1398`an ji girtîgeha bajarê “Mihabad”ê bo girtîgeha bajarê “Bokan”ê hatibûn veguhastin.

Herwisa ew 4 welatiyên Kurd bi tohmeta hevkarî kirin digel opozîsyonên hikûmeta Îranê ji aliyê hêzên rejîmê ve li sala 1398an ve hatine binçavkirin.

## Mamosteyek olî yê Bokanê hate binçavkirin

Şeva Yekşemî 25ê Befranbara 1401an a Rojî, mamosta Hesen Fethî Xizirlekî, pêşnimêjê gundê “Qaziliyan” yê ser bi bajarê Bokanê ji aliyê hêzên ewlehî ve hate girtin.

Hêzên ewlehî bi bê hebûna belgên yasayî ew mamosteyê olî binçav kirine û bo cihek nexuya veguhastine.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê ti zaniyariyek derheq tohmet û cihê ragirtina navbirî berdest nînin.

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (438)


## Wêneyên xwenîşandanên diyasporayê yên li dijî rejîma Îslamiya Îranê











